


12 guliyêñ avdari



Selîm Biçûk

**Ez di hembêza
mirinê de, tu mîna
gulek geş li hember
min vebûyî. Tu bûyî
bersiva pirsên min
yêñ li ser hatin, man
û çûnê. Te evîna min
ya xewneyî anî
rastiyê.**

Berî ku ez bihêm dunyayê min tu dîtî. Min sozek da te. Di ramana min de, tu bûyî xewnek mezin. Tu bûyî binefşek ciyayî. Tu bûyî dilopek şevnema buharê, ku rûyê sorgulan şil dike. Tu bûyî ciya. Tu bûyî agir û roj. Tu bûyî sermed û bêmirin di nav mij û leyланê de, winda bûyî.

Berî zayîna xwe, min dest bi gerê kir û ketim pey şopa te. Li kavilên bêşenî, li kolanên gundên ji leyланê, Li qeraxên dilên bêhest û evîn, li nav çadirên mirovayıya penaber, ez ketim gerek bêdawî. Carna, di xewnek revok û tirsonek de, li te dibûm mîhvan. Carna di dilekî sar û behitî de, min silav dida te. Pir caran jî min, tu li nav hêstirek daleqandî didîtî.

Neh mehan di zikê diya xwe de, li te geriyam. Li nav ceger û mîlakên wê, ez bi germiya te dihesiyam. Di dilok û lorandina wê de, tu dihatî ber çavêن min. Di êş û keserên wê de, min hêstirêن te didîtin. Lê, li buharê tu dibûyî mij, li havînê leyлан. Ez diketim gera hebûn û tunebûnê, tu jî, diketî reva çûn û nehatinê.

Min hêz da xwe ku li ser soza xwe bimînim û carekê bi herdu destêن xwe te bigirim. Bihêrs û germiyek ku êgir dişewitîne te hembêz bikim. Lê, xewnêن bitirs, kabûsêن mirinê lingêن min li qeyd û zincîran didan. Zimanê min li nav bêdengiya mirinê, lal dihiştin. Çavêن min li nav reşıya şevê, kor dihiştin. Guhêن min li nav gemara dîrokê ker dihiştin. Min nikarî bû te bibînim, li pey te birevîm, dengê te bibihîzim, yan jî, biqîrim, bigirîm û hawar bikim. Tenê di dilê xwe de, min tu parastî. Mîna gulekê, mîna perestgehek pîroz, mîna periyek bihiştî, mîna Xwedayê evînê min tu di ramana xwe de daçikandî û bêmirin hiştî.

Bi wê xewn û ramanê ez hatim dunyayê. Bi qêrîna yekemîn re navê te hat ser zimanê min. Bi tîrêja ronahiyê re, çavêن min tenê li te geriyan. Bi gavavêtina pêşî, ez ketim pey şopa te. Min rişek dûr û dirêj girt û li pey te meşiyam. Li gundêن mirinê

geriyam. Ketim riyêن bêşop. Li bajarêن windabûnê penaber bûm. Zindî, bi min keniyan û "dîno" ji min re gotin. Mirî, liser halê min giriyan.

Ji nav jiyan û mirinê, min sînor cirandin. Xewn û rastî min kirin yek. Li reşıya dilê sînorêن bextreş tu bûyî navnîşanek nenas. Li ser lêva mirinê kenekî sar. Li dilê keçen ciwan carna diriha reş, carna jî, gulek geş.

Min pir caran ji xwe dipirsî: Ez ci dixwazim? Ez dikarim xewnek mirî bikim rastî? Ez dikarim ji xeyalê rastiyê bîhûnim? Ez dikarim li bajarên mirinê jiyanê biafirînim?

... Û hemû pirs li dîwarê windabûnê tune dibûn. Mîna te dibûn mij û leyлан. Li nav perên mejiyê min yê windabûyî hêdî hêdî rastiyeck bicih dibû. Min dizanî tu qedera min î. Tu havêنê hebûna min î. Ez dikarim ji her tiştî birevîm. Lê ji te? Na, ji te rev nîn e. Tu rastiya min î. Tu ez im. Ez jî, tu me.

Di riyêن mirinê de, ez li te rast hatim. Mîna perperîkek bêçare, min xwe avêt agirê te. Dadgerê evînê ez gunehbar dîtim. Biryara şewata min da. Lê, dema li ber piyêن te dişewitîm, mîna momekê li perestgeha te dipişivîm, min jiyan didît. Min xweşiyek bêşînor hest dikir. Min nas kir ku agir jî, jiyanê ava dike. Min nas kir ku bi şewatê jî, gul

vedibin.

Û yekser bi hev re, em ketin riya hebûnê û me xwe dît. Me xwe dît û ji nû ve xwe afirand. Di dilê rojê de, em bûn çiyayên evînê. Di dilê êgir de, em bûn sorgul û binefş. Di dilê mirinê de, em bûn jiyan. Mirovahiya kor, ker û lal, me biçav, guh û ziman kir. Mirî rabûn ser piyan û meşîyan. Zindî ketin rê. Şevê konê xwe rakir û ji ronahiyê re, cih berda.

Li Geliyê Waweylê bi hezaran dirihreşk bi êgir dibirijin. Ramanê hovîtî û barbariyê bêveger dikevin revê. Zagona welatê êgir û rojê ye. Tenê evîn dikare li ser piyan bimîne. Îdî çi hêz nikare di laşekî de dil, kezeb, ceger û ramanê ji hev cuda bike. Her tişt li cihê xwe, xwe dibîne. Hemû rê diçin perestgeha evînê. Hemû dil di yek rê de, li ber xwedidin.

Û ez û tu Qamişloka min...

Em 12 rûbarêñ xwînê, 12 avdar, 12 newroz, bi hezaran Ferhad û Maşûq û yek jiyan in.

Erê ez li meydana şerê jiyanê bêçare bûm. Ez têk çûm. Mîna kelemperekî ziwa ji kokan ve hilkiyam, ber bayê ketim. Bahozek bêbext ez ji çiya û ronahiya rojê cuda kirim. Li geliyê Waweylê ez ber qef kirim. Ez sipartim mirina malkambax. Di rastiyê de, ev yek azadî û rizgariya min bû. Ji bo min dawiyeş pir xweş bû.

Ez di hembêza mirinê de, tu mîna gulek geş li hember min vebûyi. Tu bûyî bersiva pirsên min yên li ser hatin, man û çûnê. Te evîna min ya xewneyî anî rastiyê.

Ez nizanim ne tu xewnek jê min jibîrkirî yî ne jî, bi rastî te sozek da min. Lê baş dizanim ku ji bo te hatime, ji bo te dimînim û bi te re diçim...!

Û ji nijkê ve, tu bûyî xwedayê min. Min dil, raman û baweriya xwe sipart te. Li perestgeha çavêñ te ez bûm baba derwêş. Min hemû pirtûk û perestgehêñ pîroz yên kevin ji mejî û dilê xwe şewitandin. Min hemû xweda ji bîr kirin. Li şûna rojê ez li ber çavêñ te serçok bûm. Lîvîn te bûn Quble û Lalişa min. Bûn silavgeha min.

Dibe ku tu min dîn nas bikî. Ji xwe ev rastiya min e. Ez ji dînan dîntir im. Lê bawer bike evîna te û dînîtiya jiyanê ez dîn kirime. Ez bi siya xwe re dipeyivim. Di rûyê sorgulan de, te dibînim. Di tîjkêñ rojê de, çavêñ te dibînim. Ji nav xwinava baranê bîna te dikişînim. Di dengê muzikê de, kenê te dibihîzim. Li nav keldûmana dilêñ bi evînê şewitîñ ez 12 guliyêñ te yên avdarî dibînim û di nava her dilekî de ez, tu û jiyan lê didin...!
